# KOMELEY XWÊNDIKARANÎ KURD LE EWRUPA

KSSE C/O Asad P.F.301 503 1.Berlin 30

30 SAL

KSSE

AUGUST 1956

KURDISH STUDENTS SOCIETY IN EUROPE

JI BAL KOMÎTA BIRÊVEBIRINA GIŞTÎ YA KSSE

HATIYE ÇAPKIRIN

AUGUST - 1986 - BERLÎNA ROJAVA

Kurd,cara pêşî bû di mêjuwa Komela me de,ku hêjî çend meh derbas nebibûn,di nameya xwe de ji bona Abdul-Nasir ,ev daxwaza mêjuyî,xuyanîkir û pêrejî ji bona hemû Miletê Kurd û ji bona Cîhanê da naskirin, ku xebata Miletê Kurd beşeke ji xebata azadîxwaz û pêrejî armancên wê di nava xebata Miletan de dijî Impiryalizmê û Kevneperestiyê de tête bi cihanîn.
Di sala 196o de,bi biryariya Yekitiya Netewan sustema Kolonyaliyê hate hilanîn.Vaye bêtir ji 153 dewletan azadbûne.Piraniya van dewletan li Afrîqya,Asya u Amerîka Latînî têtin dîtin û gihane mafeyê xweyî siysî,lê Miltê Kurd ,ewaya nebes tenê neghaye mafeyê xweyî millî û pêkhatina çarenûsa xwe ,lê her wehajî hêjî bê mafeye ji biçûktirîn mafeyê xweyî mirovanyê.Welatê wî tête talankirin û ew bi serde jî tête kolekirin,mîna Afrîqya jêrî,rehperestî li Kurdistanê tête bi cihanîn ji bal Serdarên Borcuwaziyên Turk,Ereb û ên Îranî.
Di sala 1957 de,piştî pêkhatina Komela me bi salekê ,raperînek kurd li Kurdistana Îranê destpêkir,di bin nav û nişana Raperîna Ciwanrû, lê Rejîma Şahinşah bi belafiran,gule û top û tenkan xweste vê raperîna han bê deng bike û wêran bike.Lê tevliwêji Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa ev zor u sitema Şahinşahî li seraserî Cîhanê tazîkir, ku belê Kevneperestên xwînxwarên Serdarên Bêganeyî Îranî dixwazin vî Miletê han bi carekê wêran bikin û ji mafeyê wî millî û mirovanyê bê pişk û parbikin.Cara pêşîbû,ku Komela me ev xebata han bi geş da xuyanîkirin,di dema ku Miletê kurd li Ewropa nedihate naskirin,Xelkê nizanibû bê ka Kurd çiye,her û her li ser dev û berdevkên Kevneperestên xwînrij û xwînmijên Turk,Îranî yanjî ên Şovîniyên Ereb ên li ser Kurd nivîsandibûn,yanjî ew name,nivistokên û gotarên tirş û tal ku ji bal Cîhangerên Ewropa hatibûn nivîsan din,ku bi dûr yanjî bi nîzîkî Miletê kurd bi nebaşî,geh bi dirbûn,geh bi keleşî,geh bi vî navî yan ê din didan xuyanîkirin,ku her û her Serdarên xwe li Ewropa û Hevalbendên wanî Kevneperest ,Serdarên Bêgane li Kurdistanê bidin razîkirin.
Li sala 1958 de,di 14 deyê gelawij de,şureşeke mezin,demokrasî û pêşverû û welatperwer li Îraqê destpêkir .Tevaya sustema Kolonyalizmê li Îraqê rehên wê hatin lerizandin.Kevneperest u Hevalbendên Impiryalizmê hatin ruxandin.Patîşahê,ku bi saya Impiryalizma Ingilîzî serdarî dikir hate xistin.Komara Îraqeyî şureşger pêkhat.Di vê dema han de, Miletê Kurd,wehajî Miletê Ereb û Hêzên pêşverû li rojhelata navîn û li seraserî Cîhanê dilşad û bextiyar dibûn bi vê şureşa pêşverû û demokrasî li Îraqê.Rêberê Şureşe Abdul-Kerîm Qasim di destûra katiyî komarê de da zanîn,ku Kurd û Ereb herdû Hevbeşên welêtin.
Belê,Berzanî,ê ku ji sala 1947 de,di 17 hezîranê de,piştî ruxandina komara Mehebad,li ser destên Şahê Îranê bi alîkariya Impiryalizma Ingilîzî û a amerîkî,ku bi neçarî ew hatibû kişandin,çûbû Sovyetê. Ji wêderê careke din hatin vegerandin ji bona Iraqê û Miletê Iraq bi Kurd û ereb bi vegerandin Berzaniyan,mîna qehremanên Iraqê nebes tenê ên Kurd her wehajî ên Ereb hatin berpêşkirin.Çend xweşbû,çend geşbû ew roja han di mêjuwa Iraqê de,belê her wehajî di mêjuwa Kurdistanê de. Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa,ev bûyîna mezin di mêjuwa Iraqê de, ev bûyîna mezîn di mêjuwa Kurd û Ereb de bi pîrozî,bi şabaşî,bi dilovanî,bi tevaya hêz û hinerên xweyî biçûk pişt girtkir.Tevaya hêz û hinera xwe tirxankir ji bona liberdana vê şureşa han beramberî Kevneperestiyê û her wehajî hêzên Impiryalistiyê.Tevaya hêza xwe tirxankir û ew xiste bin destên Rêberiya şureşê ji bona parastina vê şureşa pîroz.Vê şureşa mezinî ku hêviyeke gewre vekir ji miltê îraqê re,her wehajî ji bona Miletê Kurd.Bextiyarî û geşbûn li Iraqê roj bi roj geş dibûn.Komela mejî Pasevaneki Biçûk bû ji bona danîna rêyekê ji bona Xwendakarên Kurd û her wehajî ji bona piştgirtina vê şureşa han û durujmê dostaniyê di nava Miletê Kurd û Ereb de berz u bala dikir, durujmê Demokrasiyê li Iraqê ji bona Kurd dida xuyanîkirin,ku divî durujmê han de qazancû berjewendiya Kurd û Ereb tête tê diyarkirin.
Her û her Komelê dida xuyanîkirin bes û bi tenha xwe li Iraqeke Demok-


EVANANE KONGIRÊN KOMELA XWENDEKARÊN KURD LI EWROPA JI SALA 1956 an de ku hatine girtin tanî nuha:

| | | | |
|---|---|---|---|
| Kongirê Yekem û pêkhatina Komelê | 10-16.August 1956 | | (bajarê Vîzbadin) |
| Kongirê Duhem | 2-4.1.1958 | li bajarê London | |
| Kongirê Sêhem | 4-8.8.1958 | li bajarê Miyonîx | (Elmanya Fêderalî) |
| Kongirê Çuarhem | 23-28.7.1959 | li bajarê Viyêna | |
| Kongirê Pênchem | 22-26.8.1960 | li Berlîna rojava | |
| Kongirê Şeşhem | 22-26.8.1961 | li Bajarê Munster | (Elmanya Fêderalî) |
| Kongirê Hefthem | 9-15.8.1962 | li Bajarê Braûnşvaîg | (Elmanya Fêderalî) |
| Kongirê Heşthem | 9-15.8.1963 | li Bajarê Miyonîx | (Elmanya Fêderalî) |
| Kongirê Nehem | 3-9.8.1964 | li Bajarê Hanover | |
| Kongirê Dehem | 17-22.8.1965 | li Berlîna rojava | |
| Kongirê Yazdehem | 26-30.8.1966 | li Berlîna rojava | |
| Kongirê Duwazdehem | 27-31.12.1967 | li Belgrad | |
| Kongirê Sêzdehem | 11-16.8.1969 | li Berlîna rojava | |
| Kongirê Çardehem | 1-5.8.1970 | li Stokholm | |
| Kongirê Pazdehem | 15-19.2.1972 | li Bûxarest | |
| Kongirê Şazdehem | 16-20.8.1973 | li Berlîna rojava | |
| Kongirê Hevdehem | 27-31.8.1975 | li Berlîna rojava | |
| Kongirê Hejdehem | 5-9.8.1976 | li Berlîna rojave | |
| Kongirê Nozdehem | 27-30.8.1978 | li Berlîna rojava | |
| Kongirê Bîsthem | 15-18.8.1982 | li Berlîna rojava | |

[illegible]

# KOMELEY XWÊNDIKARANÎ KURD LE EWRUPA

KSSE C/O Asad P.F.301 503 1.Berlin 30




JI BAL KOMÎTA BIRÊVEBIRINA GIŞTÎ YA KSSE
HATIYE ÇAPKIRIN
AUGUST - 1986 1 BERLÎNA ROJAVA